Êvariyeka tuxîbdayî

Êvariyeka bê serûşûn bû, bê xatirxwestin çû, parzînkê têhneka kûr li ser milê xwe kirbû terş. Palê xwe yê westyayî dida serê êvarî. Keziyên wê êvarê dêmê hezên wê maçî dikir…destê wê êrîş birine wê tîka bi ranê wê ve cihê xwekirî, û çigarek hil kir.. dûkêl dibû balindeyekî bê hiş û di asîmanî de sema dikir, li ser pêyekê wê jiyanê bihna xwe vedida û li ser payê dî xemê gehên wî di qewartin, çavên xwe di nav xeyala xwe de niqom dikirin. Hêviyên wê tê da dibûne kêvroşik, û li pişt stêran dirijiyan, eşqê hêriş dibirine ser jiyanê û diguhên wê de zêmar dikir, kefnê evînê li xwe dialand, rondikên baranê lêvên evînê maç dikirin, vîna jiyanê rondik barandin û bi kernûş li bin pê xaça Mesîhî diçû, û destê mirinê hembêz dikir.

Ji ber hindê nimêjeka dî li ser kelexê esqê kir eşq di nav hişkatiyê de dibû papûr û hemû şev dibûne dezgirên wî!.

Amîna Zikirî